# Efrîn di bin dagîrkeriyê de (272):

## Qurbaniyin kuştî û birîndar en sivîl, qutkirina darên zeytûnê, teqîna bombeyeke teqîner, dijayetiyin li ser temenmezinina di malên wan de



















Darên zeytûnê yên pîroz (jêdera serekîn a jiyana xelkê herêmê), ji aliyê Milîseyên "Artêşa Niştîmanî ya Sûrî" û anîndeyên jê nêzîk ve bi awakî rêkûpêkirî têne qutkirin, bê wijdan yan yasa û destlatek hebe wan qedexe bike, û encûmenên xwecihî û destlatên Dagîrkeriya Turkî û Hemahengiya/Kiwalisiyona Sûrî - Ixwanî bi hemî pêkhateyên wê ve û Hikometa wê ya Demkî li beramberî vê tewanê bêdeng in, nemaze jî Istîxbaratên Turkiyê berdewamkirina bikaranîna wan binpêkirin û tewanên têvel di dermafê Kurdan û herêma wan de dihevojin û serperşt dikin.

**Ev jî hin heyîn û bûynên li ser rewşên serwerkirî ne:**

**= Ziyanin şênberî û qurbaniyin sivîl:**

Di encama berdewambûna avêtina qurşîn û gule û topan di navbera Artêşa Turkî û milîseyên wê ji alîkî ve, û Artêşa Sûrî û hevalbendê wê ji alîkî din ve, li herdu aliyên hevgîhanê li Çiyayê Lêlûn, van bûyeran encam dan:

**-** Li 28.12.2023an. Z, Gundê "**Bênê**" yê di bin desteseriya Artêşa Sûriyê de tûşî şeş avêjtekên mûşekî hat, yek jê li herdu malên "**Kenco Mihemed El'ewer, Mihemed Xakî Xobarî**" ket, û ziyanin şênberî gîhandin wan malan û makîna pîkab a kesê dudiyê.

**-** Li 1.1.2024an. Z, herdu gundên "Kibêşîn" û "Bircheyderê" yên hevcîwar (ên ku Milîseyên "Feyleq El'şam" desteser dikin) rastî topebaraneke mûşekî hatin, û di encamê de ziyanin şênberî çêbûn û sivîlin hatin kuştin û hin jî birîndar bûn, jê pakrewan **("Yasmîn Lû'ey Îso** /20/sal - Kibêşîn a ku dewata wê piştî heftakê bû", "**Ziyad Selûm Hesen** /58/sal" û kurê birayê wî "**Ziyad Ehmed Selûm** /37/sal" - Bircheyder), û herweha ("**Resmiyê Xelîl Ebdo - rewşa wê metirsîdar e", "Rende Mihemed Îso", "Henîfe Îso Îso", "Lû'ey Cîhad Îso", "Xesan Lû'ey Îso", "Mihemed Lû'ey Îso")** ji xelkê Gundê "Kibêşînê" û zarokek jî ji xelkê Gundê "Bircheyderê" bi rengekî têvel birîndar bûn û hestî şikestin.

**-** Li 6.1.2024an. Z, Artêşa Turkiyê û Milîseyên wê Gundên "Bênê, Aqûbê, Soxanakê" (yên ku di bin desteseriya Artêşa Sûriyê de) topebaran kirin, û di encamê de ziyanin şênberî gihîştin malan, û hemwelatiyekî ji koçberên Efrînê mekin birîndar bû.

**= Girtinine bêsûcane:**

Li 31.12.2023an. Z, Hemwelatî "**Weqfî Elo** /40/sal", ji aliyê Istîxbaratên Turkiyê û Milîseyên "Asayêşa Leşkerî" ve hate girtin, bi tuhmeta têkeliyê bi Rêvebiriya Xweser a berê re, piştî vegera wî ji ciyê penaberiyê bo bajarê xwe Cindirêsê û rastîhatina wî ji lêkolîn û bendkirina demkî bêtirî carekê, û ta niha bêsûcane girtî ye.

**= Qutkirina darên zeytûnê:**

**-** Di hefta dawîn de ji sala borî - bi şev, giropek ji endamên Milîseyên "Firqit El'hemzat" - ji Êla "Benî Zêd", ji anîndeyên ku li Gundê "Firêriyê" - Navça Cindirêsê rûniştine, beşê herî mezin ji dora /230/ darî zeytûnê (/130/dar ên **"Ekrem Sîdo/Pelkut"-** Gundê Qurbê, /20/dar ên **"Ebid El'rehman Mûse"** - Gundê Qurbê, /40/dar ên **"Salih Mihemed"** - Gundê Hemêlkê ê hevcîwar, /40/dar jî yên **"Xelîl Şerîfî"** - Gundê Firêriyê yê hevcîwar) bi birekê elektirîkê qut kirin, piştî kesixandina wan ji aliyê xwediyan ve, lê destlatên xwecihî û serkêşên milîseyên ku wan gundan desteser dikin (Zenkî, Hemzat, El'şerqiyê) beramberî wan tewanan û

giliyên ku ji xelkê ve hatine pêşkêşkirin tu tişt ji cî nelivandin; Û were zanîn jî ku makînên êzing hilgirtine di rêbendên wan re derbas bûn.

**-** Li vê dawiyê, li cîgeh û gundên di bin desteseriya Milîseyên "Firqit El'hemzat" û di bin çavdêriya rêbendên wê de, beşekî mezin ji (/50/ darî **"Mehmûd Îbiş"**, /13/dar ên **"Ebid El'rehman Îbiş",** /13/dar ên **"Fîdan Îbiş"**, /8/dar ên **"Şêx Ehmed Hecîlo"** - ji xelkê Gundê "Keferdelê Jêrin" û /7/ dar jî yên **"Xelîl Ebid El'hemîd"** ji xelkê Gundê "Maratê") qut kirin, li cîgeheke hember balafirgeha çandiniyê û piştî Çateriya "Enderiyê" - Riya Efrîn û Cindirêsê, û berî çateriyê jî li Cîgeha "Xirêbê" /30/darî **"Mistefa Resûlo"** ji "Keferdelê Jêrin"; Û li Cîgeha "Qeracî Pe'inik" li Gundê "Maratê" jî (/15/dar ên **"Ibrahîm Eşbokê"** û /7/dar ên **"Ehmed Osman Eşbokê"**), bê ku ew milîs guhdanê bidin giliyê xwediyên zeytûna.

**-** Li vê dawiyê, /8/dar ên **"Mihemed Cimo Cimo"** ji xelkê Gundê "Aşkê Şerqî" - Navça Cindirêsê bêwijdan qut kirin, li cîgeheke di bin desteseriya Milîseyên "Ehrar El'şerqiyê" de.

**-** Li 1.1.2024an. Z, Milîseyên "Firqit El'sultan Mûrad" /25/dar ên malbata Dilovanber **"Ebid El'henan Ebdo"** li Gundê "Keferomê" - Navça Şera bi rengekî nêzîkî giştî qut kirin.

**= Geregoşî û serberdayetî:**

Li Êvara Înê 5.1.2024an. Z, bombeyeke teqîner di îçî xezanek gemarê de -li nêzîk nanpêjxaneya "Ebû Îmad" ya otomatîk li orta Kolana Reco ya serekîn - Bajarê Efrînê teqiya, û di encamê de ziyanin şênberî çêbûn, û zarokek û du mêr jî mekin birîndar bûn - li gor "Berevaniya Sivîl li Efrînê".

**= Binpêkirinine din:**

- Li şeva 26.12.2023an. Z, li Gundê "Qota" - Navça Bilbilê, yê ku Milîseyên "Firqit El'sultan Mûrad" desteser dike, du çekdaran mala hemwelatiyê Kurd "**Reşîd Şêxo** /65/sal" basmîş kir, mekin li herdu hevjînên ku nû ji xew rabûne xistin, û di encama pevçûna di nav wan çêbûye de nikanîn tu tişt bidiziyana, û piştî gefdana wan bi kuştinê jî ew bi matoreke duloqî reviyan; Û ji ber lêxistineke bi destikê dabancê di serî de mêrik ji hiş ve çû, û bo nexweşxaneyeke Efrînê hate hawarekirin û ta niha li nav nivînan di mal de ye; Û ji bo behanekirina dijîkirinê, serkêşên "Firqê" hewildan tuhmetê bi endamekî ku bi "Şerîf" tê navdan (ê ku şênberên hişbirînê vedixwe) bizelqînin.

**-** Li 31.12.2023an. Z, çekdarina du betariyên taqeta elektirîkê û cerakî gazê û tiştine din ji mala Hemwelatî "**Ehmed Misto**" ji Gundê "Keferomê" - Navça Şera dizîn, li dema nelimalbûna endamên malê di serdaneke li nav gund de.

**-** Li şeva Înê 5.1.2024an. Z, şeş çekdarên rûpêçayî mala hemwelatiyê Kurd "**Hemîd Mistefa** /70/sal, hevjîna **wî Fatmê Henan** /68/sal, û keça wan **Gulîstan**/25/sal - a nexweş" li Gundê **"Memala Rojhilat/şerqî"** - Navça Reco basmîş kir, hersê bi kêndirê girêdan, zêrmêr (gustîlk, bazing, guhar) ji herdu jinan û amûreke xilyewî û tibabeke diravî (/900/Dolar ên temenmezin û /4500/ Dolar jî emanet li cem wî) dizîn, gencîna/xizêna textî a kincan bi ser mêrik de gêr kirin û bi çoyan li hersiyan xistin û reviyan, bi ser hebûna rêbendeke Milîseyên "Firqa Nehan/El'firqe El'tasî'e" bi sed mitrî dûr li çateriya gund, û jê ve nêzîk jî rêbendeke hevbeş e Milîseyên "Asayêşa Leşkerî û Firqê Nehan û Ehrar El'şerqiyê"; Û ji ber wê rewşa hersiyan ên tenduristî û derûnî pîs e/bed e.

**-** Li vê dawiyê, piştî ku Milîseyên "Firqit El'Sultan Silêman Şah - El'emşat" /10/hezar Dolar Emrîkî vêrgî li ser her guvêşgeheke zeytûna ku dikeve bin bandora çarçewa wan ferz kirin, û hemwelatî "**Zekeriye Mihemed Reşîd** /51/sal" ji xelkê Gundê "Qermîtliq" - Navça Şiyê û xwediyê guvêşgehekê da xuyakirin ku nikane bide, ji ber wê ji aliyê endamên "El'emşat" ve hate revandin û îşkencekirin, û hate neçarkirin ku bide.

Bi ser ku qutkirina darên zeytûnê ji tewanên ku rojane li Efrînê pêk tên, em li ser rûpel û di helwestên rikberiya Sûrî de -ji bilî hinekan- şermezarkirin û bangewaziyên seknandinê wê nabînin.

07.01.2024. Z

**Nivîsgeha ragihandinê- Efrîn**

**Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê**

--------------------------

**Wêne:**

- Hersê pakrewan "Yasmîn Lû'ey Îso, Ziyad Selûm Hesen, Ziyad Ehmed Selûm".
- Topebarankirina Gundê "Kibêşînê" - Çiyayê Lêlûn, 1.1.2024. Z.
- Qutkirina darin zeytûnê li nêzîk Gundê "Qurbê" - Navça Cindirêsê, yên Hemwelatî "Ekrem Sîdo/Pelkut", ji perçevîdiyoke belavkirî, ji aliyê çalakvanê ragîhandinî "Ehmed El'berho" ve, li dîrok 3.1.2024. Z.
- Qutkirina darin zeytûnê yen xelkê Gundê "Keferdelê Jêrin", ji perçevîdiyoke belavkirî, ji aliyê çalakvanê ragîhandinî "Ehmed El'berho" ve, li dîrok 1.1.2024. Z.
- Qutkirina darin zeytûnê li Gundê "Maratê", destpêka Rêbendanê 2024. Z.
- Qutkirina darin zeytûnê yen Malbata "Ebid El'henan Ebdo" li Gundê "Keferomê" - Navça Şera.
- Teqandina bombeyeke teqîner di hundir/îçî xezanê gemarê de, li orta Kolana Reco li Bajarê Efrînê, li Êvara 5.1.2024an. Z.